

### **Çima Iranê Celalî bi Pasdar û Topên xwe ve ji bona Kurdistanê dane vegerandin?**

Şopeke xwînavîyê diyarî Îranî ji pêla Axmenî, Sasanî, Sefewî, Gecerî, Pehlevî û Komarî di nava mêjûwa xebata rewayî Miletê Kurd de tête dîtin. Rojekê ji rojan siyaseta Şahîşahiya Îranî û herwehaji pêrejî siyaseta Komara Îslamîyî Îranî jî bi dujminatî û dirbûna xwe ve beramberî xebata Miletê Kurd di seranserî Kurdistanê de ji bona Mafeyê Milî mûyekî nehatîyê veguhertin. Ew ligel Dewleta Osmanî de û herwehaji li paş parvekirina Kurdistanê de piştî Cenga Cihanêyî Yekem de hergav bi peymanên siyasî yanî bi peymanên sipahî ve beramberî tevgera Miletê Kurd dihate rawestandî û di encamê dawî de wê ligel Dewletên Dagîrkerên Kurdistanê de ew tevgera hanê dida xistin; ji ber wêna di her bizaveke kurdîyî biçûk de jî tîrsa serhildana Kurdan ji bin koletî û bendîtîya xwe dida dîtin.

Wehaji nihajî li Kurdistana jêrin de piştî xebateke xwînavîyî dûr û dirêj bi saya Berzanîyê Mezin û di bin Rêberîya Partîya Demokratî Kurdistan de xewneke xweş piştî demeke tarî û dirêj di bin jêrdariyê de bi pêkhatina Dewleta Meyî Federalîyî perest ve hate pêkhatin. Vê Dewleta hevîya tevaya Kurdistanê cerg û hinav li Talankerên Kurdistanê de date sûtandin û bingehê koletî û bendîtîya wan di nava Welatê me de date hejandin û ji tevaya Dunyayê re bi rûxandina wê koletî û bendîtîyê date mujdekirin.

Dewleta Îranê niha ji mîna Şahê Ismaîlî Yekemî Sefewî(1487–1524 Z.) ji dêlava ku ew dostanîyekê û hevkarîyekê li ser berjewendîya hevbeşî de ligel Kurdan de bide durustkirin, wêna destên xwe bi xurtî ve der sala 1964 de ji bona Talebanîyên Xwefroş date dirêjkirin, da ku ew di rêya van Xwefiroşan de Dewleta Federalîya hevîya jîna me bide nabûdkirin. Belam siyaseta Partîya Demokratî Kurdistanêyî rast û durust pîlanên Komara îranî ji Miletê Kurd û herwehaji ji tevaya Bîr û Bawerîya Cîhanê re date rûtkirin. Wêna pitşa Talebanîyan bi hêrişê wan ve ji bona ser Kurdistanê date girtin û wê ew gemara Civaka me ji nûve careke din dane vegerandin, ji yê ku ew ji nava welatê me hatibûn pengizandin.

Îranê bi lez û bez ve bi Pasdar û Topên xwe ve Celalîyên Nokerên xwe bi dî we ve ji bona nava Kurdistanê dane rakişandin, da ku ew zalbûna xwe nebes tenê ji bona ser Kurdistanê bidin durustkirin; lêbelê wê li ser tevaya Îraqê de bidin zalkirin. Ev karê Îranê Rast û durust rûdanên mêjûyîyî pêla Ismaîlê Sefewî careke din ji me re bi hemû tîrş û talîyên xwe ve û herwehaji bi hemû kûrbûna kêrên xwe ve di mêjûwa Kurd û Îranî de dide derxistin.

Pîrsa ku niha Kurd û herwehaji Bîr û bawerîya Cîhanê ji xwe didin kirin, Magelo dê ev siyaseta Îranîyî dilbijandî di rêya Talebanîyan de di Kurdistan û Îraqê de bikaribe bête biserkevtin? Bersiva vê pîrsê tevaya jana siyaseta Îranî di Rojhilata Navînî de û pêrejî di nava Kurdistanê de dide derxistin. Ev siyaseta ku ew di vî sedsalê me de ji nû ve dixwaze neqş û dewlemendbûna Rojhilat û Kurdistanê ji bona qazanc û berjewendîya Îranê bi darê zorê û hêjî bêtir bi devên tank û topan ve bide veguhertin. Em tev dizanin, ku ev siyaseta Îranê di cenga Îraqî-Îranî de di 22. 9. 1980 de li paş heşt salên xwînavî de ne bi qazanca Îraqê û ne jî bi qazanca Îranê ve hate derkevtin; lêbelê wê cengê nebes tenê dewlemenbûn û hêza Merovanîya Îraqê û Îranê date berbadkirin; lêbelê wê tevaya perîşanî û rebenîya siyaseta van herdu Dewletên li paşvemayî de ji bona tevaya Dunyayê re date derxistin.

Bi vê siyaseta xwe ve Îranê bi piştîlêgirtina Celalîyan ve careke din mîna pêla Şah Îsmailê Sefewîyî yekem der sala 1514 de hevalbendîtîya Miletê Kurd ji destên xwe dide berdan û careke din dujminatîya xwe mîna hercar ji nûve beramber bi Miletê Kurd ve dide xuyanîkin. Hevalbendîtîya Celalîyan ji bona wêrankirina Dewleta meyî Federalî û nemankirina Partîya Demokratî Kurdistan hîç gûman têde niye, ku dê ev karê hanê li ser Îranîyan de gelekî di encamê dawî de bi kêrtir ve ji kêra pêla Îsmailê Sefewî de bête derkevtin; tevî ku hemû merc û zînetin niha û herwehaji bingehê hîş û berjewendîya Dewleta Îranê û Miletê Kurd dostanîyê di nava Partî û Îranê de jî dide pêwîst û neçarkirin.

**Dr. M. S. Cuma**

**Selaheldin, di 29. 10. 1996 de**

## Çima çil û Şeş Dîlên Pêşmergên partî bi şêweyekî hov dane kuştin?

Di 2o vê mehê de ez li paşnîvro de ji bona serdana bajarê Ranya çûm. Min dixwest bi çavên xwe ve cihên kuştina çil û heft pêşmergên partiyên dilkirî ji bal Yekîtîya Neştîmanîyî Talibanî de di 14. 1o. 1996 de bidim dîtîn, gelo ma evaya wer rastbû?

Belê di nava baregeha partîya Yekîtîya Neştîmanî de Pêşmergên Partîyî dilkirî di bajarê Ranya de bi tivir û qazman hin ji Pêşmergan dane letletkirin û hinên din jî ji wan dane gulebarankirin.

Li ser ban de wan ew karên dir û hov dane kirin, da ku bi xwîna wan ve navê Partî ji ser arma bi derî vekirî ve bidin reşkirin. Hêjî arma navê Partî bi derî ve ye û him arma Partî, dîwarî xanî û hewşa baregeh tev bi xwîna kuştina pêşmergan têtin sorkirin.

Bi dîtina vê dîdara hanê bi lez û bez ve gelek bîrwerîyên mêjûyî di jîyana min de hatin derbskirin. Min gelek cihên hovîtyê di nava welat û Miletan de çî di nava welatên rojhilat de yanjî di nava welatên rojava de dane dîtîn; hîç cudabûna vî cihî ji wan cihên din nedihate kirin û hîç jî dirbûn û hovbûna vî karî ji dirbûn û hovbûna wan karan nedihate cudakirin.

Wer di mêjûwa Merovanyê de li seranserî cihanê de dir û hovîti nala hevin. Hîç cudabûnek di nava wan de nayête dîtîn.

Gelo bi vî rengê hanê ve kuştina Dîlên Cengê ma ew ne li dijî hemû reweşt û rûniştinan têtin derkevtin? hêjî bêtir ma ev karê hanê ne li dijî peymanî Cinêf de der sala 1925 de der barê Dîlên Cengê de tete derkevtin?

Hîç gûman di vî karê dir û hov de ji bil tawankariyên Bokasa, Idî Emîn û Polpolt pêve nayêtin dîtîn. Tevaya bîr û bawerîya Kurdistanê û herwehaji bîr û bawerîya cihanê jî vî karê dir û hovî Yekîtîya Neştîmanî bi tawankari dide danîn. Hêjî bêtir bîr û bawerîya Kurd û cihanê jî vî mêrkujîya Yekîtîya Neştîmanî nebes tenê bi tawankariyê ve beramberî bi Kurd ve dide dîtîn, lêbelejî hêjî bêtir ew vî tawankariya dir û hov bi tawankariya Rêberên Yekîtîya Neştîmanî ve beramberî bi Mirovanyê ve didin danîn. Ev tawankariya Neştîmanî wan li seranserî Kurdistanê û cihana bajartî de bi hov û mêrkûj ve dide derxistin û bi çavekî pîrî nizim ve li van Rêberên Yekîtîya Neştîmanî didin temaşekirin.

Hîç rojekê ev karê hov ji mêjûwa me Kurdan nayête derkevtin, dê ew her û her nala rûpelekî reş û tarî di mêjûwa tijeyî Yekîtîya Neştîmanî de bi karên weha dir û hov di mêjûwa sî û du salên wan de neyête jibîrkirin.

Hîç gûman tede niye, ku dê cihê Talebanî û dam û darên wîna nala Bokasa, Idî Emîn û Polpot li ser sergoyê mêjûwê de bête dîtîn.

Dr. M. S. Cuma

Dr. M. S, Cuma  
Selaheldin, di 21. 10. 1996 de

## Rêberên Qelp û Neza

Di nava hemû Welat û Miletên li paşvekevî de û herwehaji di nava Welat û Miletê me de newxeşîyeke civakîyî pir bi derd ve têtin, ku ew pîrbûna bêjimara Rêberên Qelp û Nezan di nava wan Welat û Miletan de ji bedbextîya nezanîya wan têtin peydakirin. Ew di nava hemû Partî, Sazmendî, Civat û Rêxistinên wan Welat û Miletan de li binguhên hevdu de têtin kevtin. Werjî ev Merovên hanê di nava Civaka Kurdistanê me de ji bedbextîya me jî pir bi pîrbûn ve têtin dîtin. Ev hebûna wan Merovan bi vê pîrbûn û belavbûna wan ve nîşaneke pir tîrş û tal ji netêgihîştina giştîyî û sarbûna lîpaşvekevîna Civakî jî me re dide derxistin.

Di Civaka Sedsalên tariyî Navînî de di seranserî Ewropa de Merovên pîrî Rêberên Qelp û Nezan di nava wan Civakên Ewropî de dihatin pîrkirin û peydakirin. Di tevaya mêjûwa Ewropa de di Dema Sarkirin û tariya Sedsalên Navînî de ev gemara Civakê di nava dam û destgehên wan de dihatin peydakirin. Hergav di wê Dema Sarkirin û tariya Sedsalên Navînî de wan Welat û Miletan pir derd didan hilgirtin û wan golên xwinê didan dagirtin. Şer û Cengên pir giran û wêran di nava Bajar û Gundên wan de ji bona berjewendîya wanî pir sade û xav dihatin vexistin. Bajar û Gund dihatin talan û wêrankirin û wan bi vi rengî ve Yek ji sisêyan jî pîrbûna kuştina Neşîvanên xwe ve dane windakirin.

Wetov bi neçarî ve Ewropa di wê pêla mêjûyî de mîna Welat û Miletên li paşvekevîyî niha de tûşî wan Rêberên xweyî Qelp û Nezan hatibûn kirin. Hebûn û mana Wan Miletan jî destên Rêberên wanî Qelp û Nezan bi ber metirsiyê ve hatibûn kevtin. Di bin mercên metirsiyî mêjûyîyî wisa de bi neçarî ve Şiyarvan û Remangîrên Dema Vejandinê di nava Welat û Miletên Ewropî de li ser bingehê Felsefa Kilasîkîyî Yunanî de, ya ku ew bes li ser bingehê hiş de têtin hîmkirin, hatin peydakirin. Wan Şiyarvan û Remangîran bi mêrxasî û gemasî ve bîr û bawerî û remanên Dema Vejandinê beramberî wan Rêberên Qelp û Nezan di nava Welat û Miletên xwe de dane belavkirin. Wan bi van karên xwe ve berên hemû şer û cengan di Civaka xwe de ji şerên Rêberên Qelp û Nezan bi şerê di navbera tarî û ronahîyê de, bi şerê Gelêrî ve beramberî bi Rêstika Derbegeyî Sedsalê Navînî de datin veguhertin. Pir serên wan Rêberên Qelp û Nezan nala gogan li ber kaşoyên Remanên Dema Vejandinê hatin berbadkirin. Ev Dema Vejandinê di Seranserî Ewropa de di 14. tîrmeha sala 1789 de di Şûreşa Firensîyî pîroz de hate bitac û xelatkirin. Wetov di encamê dawî de Şureşa Firensî bi bîr û baweriyên xweyî Merovanîyî bilind ve tevaya Ewropa jî Rêberên wêyê Qelp û Nezan date malandin. Ji wê roja pîroz de Welat û Miletên Ewropa roj bi roj ve û hêjbêtir tanî vê roja me jî hergav ber bi pêşveçûn û pêşveketinê ve bi xurtî ve têtin çûyîn, ku tevaya Miletên Ewropa dûr yanî nêzîk xwe di qonaxa pêşvekevîna Merovanîyî niha de didin dîtin, yên ku ew her dem dibêjin: sal bi sal ve xwezî bi îsal ve.

Pirsa ku niha xwe bi neçarî ve ji me dide kirin, Magelo tanî kengî dê ev Welat û Miletên li paşvekevî de û herwehaji Welat û Miletê me jî xwe ji van Rêberên Qelp û Nezan bidin rizgarkirin? Bersiva vê pîrsa sade, belam pir giran bes û bi tenha ve Merov dikare wê ji serpêtiyên mêjûwa Miletên Ewropî de di Dema Vejandinê de bide derxistin û hêjbêtir werjî wê bidin bersivkirin; bê ka wan Miletan di wê qonaxa mêjûyîyî giring de çî jî xwe re dabûn kirin, werjî dûr yanî nêzîk jî ev Welat û Miletên li paşvekevî de û herwehaji Miletê me jî divê wê rêya pîrozî Dema Vejandinê bi lez û bez ve û hêjbêtir bi xurtî jî ve ji xwe re bide girtin, da ku ew ji van bedbextiyên nezanîya xwe bêtin rizarkirin û tevaya Civakên xwe ji gemara wan Rêberên xweyî Qelp û Nezan bidin paqijkirin. Ev Rêberên Qelp û Nezan jî nava Civakan bi neçarî ve têtin kat û derkevtin; belam çî gava ku têgihîştin û şiyarbûna giştîyî Miletê li ser zemîna Dema Vejandinê de bêtin hîmkirin û ew li ser zanistî û zanebûna Merovanîyî niha de bêtin bipêşvexistin, wê hingavê Welat û Milet jî Rêberên xweyî Qelp û Nezan têtin rizgarkirin û ew nala Welat û Miletên pêşvekevî cihên xwe di nava pêşvekevîna Civaka Merovanyê de ji xwe re didin girtin. Werjî dê Miletê Kurd jî di nava Dewleta Kurdistanê xweyî Milî de bi bextiyarî û xweşî ve bête jiyandin. Ew jî dê mîna Miletên dinî pêşvekevî bide gotin: Sal bi sal ve xwezî bi îsal ve.

Dr. M. S. Cum

Selaheldin, di 10. 11. 1996 de

Kêra biryara firtona Neftê beramberî bi xwarin û derman ve ji bona Kurdistanê

Biryara 986 Civata Ewlebûnê ji bona Firotna Nefta Îraqê her Şeş Mehan bi Du Milyard Dolar ji bona kirîna xwarin û vexwarinê ji bona seranserîya Îraqê û jê 360 Milyon Dolar ji bona Herema Kurdistanêyî rizgarîkirî bi rûdaneke bê nimûne di mêjûwa siyasî û abûrîya Welatê me de tête derkevtin. Ev rûdana hanê dê geşbûneke abûrîyî pir baş nebes tenê di jîyana xweşbûna abûrîyî Welatê me de bide hiştin; herwehaji dê rûdaneke pir giring û giran di parvekirina hemû hatina abûrîya Dewleta Îraqê de ji bona tevaya herema Kurdistanê di ayinde de li dû xwe de bide hiştin. Ev parvekirina hanê beşekî giring ji hatina bazirganîya Dewleta Derveyî Îraqê di warê firotna neftê de bi saya biryara Civata Ewlebûna Yekgirtina Netewan ve ji bona Kurdistanê dûr yanî nêzik pêrûniştineke eşkere û diyare bi Mafeyên Miliyî Siyasî him ji bona herema Kurdistanê û himjî ji bona Miletê Kurd di nava Welatê wî de li gora amara wî de tête dîtin û derkevtin. Ji bil pêrûniştina bi parvekirina hatina Dewleta Îraqê ji neftê di nava Kurdistan û Îraqê de hêjbêtir ev pêrûniştineke pir giring û bi kêr ve ji bona Mafeyê Siyasî Kurd di Kurdistana Îraqê de ji bal Civata Ewlebûna Yekgirtina Netewan di vî sedsalê me de tête derkevtin. Ev pêrûniştina hanê bi giringbûn û hêjatiya xwe ve ne kêrî bendên Peymana Siver der sala 1919 de û bi biyara siwana parastinê ji bal Dewletên Hevalbend der sala 1991 de bi Pêrûniştina xwe ve ji bona Kurd tête derkevtin. Biryara Siwana Parastinê ji bal Dewletên Hevalbend beramberî Miletê me bi karekî Merovanî ve dihate derkevtin. Gelek Peyman û Biryar di mêjûwê de beramberî Kurd hatine morkirin yanî hatine derkevtin; belam hêjî wetov biryareke giring, giran, kûr û bi kêr ve di warê pêşvexistina jîna Civaka me de û li ser rêya çarekirina Pirsê Milî de ji bona Miletê Kurd rast û durust nehatiye derkevtin.

Li ser vê biryara hanê de bigir ji sedî sî di encamê dawî de ji hatina firotna vê Nefta Îraqê ji bona Miletê Kurd tête derkevtin, ku bi vî rengê hanê ve di encamê dawî de talaniya Dewlemendbûna Welatê me di Îraqê de pir bi başî ve dê bête bidawîkirin.

Ji Sedî Sî ji nêrxê firotna vê Neftê ji bona Ziyana Cenga Kendavê tête hilanîn, ji sedî Heştdeh jê di nava Herema Kurdistana Rizgarîkirî de ji bona Rêxistinên Yekgirtîya Netewan tête belavkirin û Pêncî û Du ji Sedî ji bona Îraqê ligel Beşê dinî pêveyî Kurdistanê tête hiştin. Heger ku em para tevaya Kurdistanê ji Beşê mayî ji nêrxê firotna Neftê tevî bidin derxistin, dê ew rast û durust jê bêtir ji Sîyî ji Sedî jê bête derkevtin.

Pirsê herî giring ku niha ji me re li ser vê parvekirina nêrxê firotna Neftê de tête kirin, magelo ji vê pêrûniştina hanêyî siyasî û abûrî ji bona Miletê Kurd û Perçê Kurdistana Îraqê ji bal Civata Ewlebûna Yekgirtîya Netewan nebes tenê beramberî Dewleta Îraqêyî Nawendî herwahaji ji bona tevaya Dunyayê mestir tête derkevtin? Magelo evaya ne rast û durust bi pêrûniştineke siyasîyî pîrî giring ve bi vê Federalîya me ve tête derkevtin, ya ku bi vê parvekirina ji hatina firotna nêrxê Nefta Îraqê bingehê wêyî abûrî tête xurtkirin û hêjbêtir ew bi vî şeweyê parvekirina hatina Miliyî Îraqê ve di warê firotna Neftê de li ser biryara Civata Ewlebûnê de bi bingehê yasayî ve ji bona Miletê me tête derkevtin?

Hêç rojekê ji rojan bidestkevtineke abûrîyî wetov xurt û baş di seranserî mêjûwa me de li ser bingehê biryareke Civata Ewlebûna Yekgirtina Netewan de wetov giring, giran û bi kêr ve ji bona Miletê Kurd beramberî Dagîrkerên wî jê re nehatiye derkevtin.

Miletê Kurd divê vê bidestkevtina xweyî mêjûyî li ser bingehê hiş û berjewendîya xweyî Miliyî bilind mîna reşikên çavên xwe bide parastin; ji ber ev kêsa mêjûyî dergehê xurt û fireh ji bona hêsanîkirina gihastina armanca meyî milîyî bilind di çarenûsa Miletê me de ji me re dide derxistin.

Miletê me û herwehaji Miletê Erebi di Îraqê de bi firotna vê Neftê ve gelek der û kulên wî di warê nexweşîya jîyana wan de hinekî têtin hêsanîkirin. Hêjbêtir ev şeweyê parvekirinê ji hatina Milî ji bona Miletê Erebi û Kurd di seranserî Îraqê de di encamê dawî de bi çarekirina pirsê Kurd bi şeweyekî aşîti û demokrasî ve di Îraqê de li ser berjewendîya Erebi û Kurd de tête dawîkirin.

Dr. M. S. Cuma

Selaheldin, di 3. 12. 1996 de